# Arthur Rimbaud

# Une Saison en Enfer

# Demsaleke di dojehê de

Kurdmancî:

Ebdulrehman Efîf

Carekê, dema rast bête bîra min, jiyana min şahiyeke payebilind bû, li wê dilan gişan xwe vedikirin, li wê bade û şerab giş diherikîn. Êvarekê min bedewî danî ser çoga xwe.- Û tehl min bi wê hestkir.- Û jêre sixêf û xeberdan. Min xwe li beramberî rastdariyê û dadmendiyê bisilehkir. Ez reviyam. O pîrebokino, o perîşanî, o qehr, hûn in, ên min buhacewhera xwe spartiye we! Bi min re çû serî, her hêviyeke mirovan windabikim di ruhê xwe de. Min êrîşî her kêfê kir, wê bo bifetisînim, bi çengeke dewarane ya dizlawirî . Min bang zorkeran kir, da ez, di têkçûnê de, dev boriyên tivingên wan bikim. Min bang perîşaniyên herî mezin kir, xwe bo bixeniqînim bi qûmê, bi xwînê. Nexweşî Xwedayê min bû. Min xwe dinav qirrêjê de veziland. Min xwe bi bayê kuştinê zuhakir. Û min ji dînitiyê re li têlên muzîka xwe da. Û buharê ji min re kenê herî nexweşik yê ehmeqan anî. Aniha kurt, dema ez amade bûm, hilma dawî bikişînim, min biryarda, kilîta şahiya kevnar dîsa lê pigerim, ya li wê şahiyê belkî careke dî dilê min here xwarinê. Dilovanî ye ev kilît.- Ev inspîrasiyon û çêbûn eşkeredike, ko min xewn dîtiye! “ Divêt tu keftar bimînî û her wilo …”, cinn bangdike, yê ko serê min bi efiyûnkulîlka spehî bitacdike. “ Mirinê bidestbixe bi dilçûnxwarina xwe gişî, bi ezheziyê û miringunehkariyan gişan.” Ax! Min ji vî tiştî pirr vexwariye: - lêbelê, Şeytanê delal, ez te sûnddidim, bê vî awirê hêrs be! Û di dema tu li hêviya hineke tirsonekiyên biçûk ên piştre tên dimînî – tu, yê ji nivîskar hezdikî, yê salixdan û hînkirin dûrî wî ne – diyarî te dikim van rûpellên hindik ên xerab ji notpirtûka xwe, ya lanetlêhatekî.

## XWÎNA ŞERHEZ

Di min de ji neviyên xwe ên gallî ev çavê şînspî, ev hişê teng û nejîrbûna di pevçûnê de hene. Ez lixwekirina xwe jî wilo berberane dibînim wek ya wan. Lê ez rûn di por nadim. Gallî ew heywantadekar û bexçeşewatkerên herî ehmeq bûn. Ji wan dirêjî min bûye: pûtperestî û hezkirina ji gunehkirinan re;- oh! Giranî tev, hêrs, bêedebiya mezin, bêexlaqî;- bitaybetî derew û jênehatî. Ruhê min ji her karê destan dire. Hoste û şagirt, ev kom tev, sext û kirêt. Destê pênûsê wilo baş e wek destê li ser erdgêsinî.- çi serdema destan!- tiçarî dê destê min ne di bin biryara min de be. Bivirde karê kole baş dûr diajo. Rastgoyiya parsekiyê min dixapîne bi herî êşa kûr. Mêrkuj û jimêranîketî wekhev dilê min dixelînin: ez birastî pak im, û ev ji min re ne giring e. lêerê! Kê zimanê min ewqasî dekbazkiriye, ko wî ta niha tembeliya min birêvebiriye û parastiye? Bê ko tenê ez laşê xwe bixebitînim, û tiraltir ji reqê, li hemû derê jiyam. Ti malbat li Ewropa nîne, ya min nasnedikir.- Ango malbatine wek ya min, ên hertiştî vederdixin ji daşîrovekirina mafên mirovan.- Min her lawên ji malbatên baş naskirin! Heke min tenê, di ku de di dîroka Ferensayê de, xwe bikarîba vegeranda kesekî! Lê na, ne tiştek. Ji min re baş eşkere ye, ko ji pêşî de ji nijadekê kêmnirx bûm. Ez nikarim serhildanê têde bigihêjim. Nijada min timî tenê serradikir, da kesên din talanbike: wek guran bi lawirê ew nekuştibin re. Ez dîroka Ferensayê, keçika mezin a kenîsê, dikişinim bîra xwe. Minê, wek koleyekî, rêwîtiya bi ber erda pîroz de bi kesên din re bikira; cadên deştên şvêbî di serê min de ne,

wênên ji Bysansê, sûrên Orşelîmê; perestiya Marî, hestponijandinên bi yê xaçkirî di min de şiyardibin dinav sihirkerên dinyayî ên bi hezaran de.- Ez dinav perçên denên şkestî û stiriyan de rûdinêm, qewirandî, li ber lingê dîwarekî rokê ew herifandiye. – Dûra, wek siwarkoleyekî, ezê di bin şevên Elmanyayê de jiderve razama. Ah! Hîn ev jî: ez sebta pîrebokan di daristancihekî vala û vêketî de bi pîrejinan û zarokan re direqisim. Ez nikarim hînter bidawîve biramim, wek çawa ev erd dike û xiristiyanîtî. Bênavbir min dikarîbû xwe di vê çûndemê de dîsa bidîta. Lê timî tenê; bê malbat; diserre- ez bi kîjan zimanî axivîm? Ez xwe de şêwira Xirîstus de dibînim, yekcar ne di ya Xwedê de- şûngerê Xirîstus. Îcar ez çi bûm di sedsala çûyî de: ez xwe dîsa îro dibînim. Nijada kêmnirx hertişt dest danîbû ser- gel, çawa mirov dibêje, hişmendî; netewe û zanistî. Oh! Zanistî! Mirov hertişt dîsa dayehev. Bo laş û can- wek qût- dermandarî û fîlosofî heye- dermanên malê ên pîrejinan, raxistî wek starnên gelêrî. Û dilxweşiyên axan û lîsk, ên ew qedexedikin! Jiyografî, kosmografî, mêkanîk, şîmî!…Zanistî, payebilindiya nû! Pêşgavî. Cîhan pêşve gavan davêje! Çima ew xwe nagerîne? Ev e daeşkereyiya jimaran e. Em dirin ber bi *giyan* ve. Ev pirr rast e, ev falvekirin e, tiştê li vir dibêjim. Ez têdigihêjim, û jiber nizanim çawa xwe derbibirînim bê gotinên pûtperestane, dixwazim ez dengnekim. Xwîna pûtperestane dîsa têt! Giyan nêzîk e, çima Xirîstus alî min nake û rûmetiyê û azadiyê nade canê min. Ax! Dema Incîlê çûye! Incîl! Incîl! Ez libendî Xwedê bi çavbirçîbûnekê hesttij dimînim. Ez ji nijadekê nirxkêm im hîn ji herheyiyê ve. Aniha ez xwe li ser pervê armorîkanî dibînim. De bera bajar biçirisin êvarî. Roja min bidawîhatiye ; ez dev ji Ewropa berdidim. Dê bayê

derya pişikên min bişewitîne ; derên bitenê û dûr dê pirça min tarîbikin. ´zê bijenim, gîha hûrbikim, nêçîrêbikim, nemaze : çixarê vexwim ; şeraba şewitandî vexwim, germ wek hesinê kelandî- wilo wek kalên hêja dikirin li dora êgir. Ezê vegerim, bi laşendamine ji hesin, tarî çerm, bi awireke tehl: mirov dê bibêje ev ji nijadekê xurt e bi sedema maska ser rûyê min. Ezê maldarê zêr bim : ezê tembel û bêrehm bim. Pîrek erê li van şehtên bûne kûvî ên ji welatên germ vegeriyane, miqatebûnêdikin. Dê ez têkevim nav jiyana politîkê. Rizgarbûyî. Aniha lê ez lanetkirî me, dilê min ji welatê min dixele. Yê herî baş xeweke mest û kûr li ser perav e.

Dê koçkirin nebe.- Îcar dîsa rêyên vê derê, li ser milan gunehkariya min, ew gunehkarî, ya ji dema min dest bi ramandinê kir, wê qurmên xwe ên êşê di kêleka min de kûrçandin- ew ya bi ezman ve hildikişe, li min dixe, min davêje erdê, min kaxetcamdike. Bêgunehiya dawî û şermokiya dawî. Va hate gotin. Ne pirrtir cîhanê bi dilxelandina xwe û xiniziyên xwe gunehkarbikim. Pêşve! Rê, gunehkarî, biyaban, acizî û hêrsbûn. Ji kê re bixebitim? Ji kîjan wehşî re perestiyêbikim ? Xwe bavêjim kîjan wêneyê pîroz ? Kîjan dilan divê ez bişkînim ? Baweriyê bi kîjan derewê bînim ? . Di kîjan xwînê de jêravbibim ? Nemaze xwe biparêzim ji rastdariyê(dadmendiyê).- Jiyana dijwar, bêhestiya rût-, hildana devê tabûtê bi destekî zuha, xwe têde rûniştin, xwe fetisandin. Îcar bê ti pîrbûn û bê ti metirsyarî : tirs ne ferensî ye. Ax ! ez wilo bitenêhiştî me, ko ez, mîna wêneyekî Xwedayan, hêviya xwe bo tekûziyê pêşkêşdikim. O bêkêriya min, o rehmdiliya min a hêja! Li vir binî, biserde! *De profundis Domine,* bêhiş im ez !

Hîn baş zarok, li gunehkarê nayêt tewandin ecêbmayî dimam, yê li piş wî hercar jinûve zindan dihate girtin ; ez li cîwar û odeyan digeriyam, ewên wî bi rûniştina xwe di wan de ew pîrozkiribûn ; min *bi çavên wî* dît ezmanê şîn û karê kulîlkvedanê yê zeviyan ; min pextreşiya wî di bajaran de hilmkir. Hêza wî ji ya pîrozzilamekî pêtir hebû, şehrezatir bû ji rêwiyekî – û wî tenê xwe, xwe bitenê wek şahidê navdarî û têgihiştina xwe didît. Li ser kûçan, di zivistanşevan de, bê war, bê cil, bê nan, dengekî xwe li dilê min ê qeffilî gerand : » Qelsî an xurtî : tu li vir î, ev xurtî ye. Tu nizanî, tu diçî ku, ne, çima tu diçî, derbasî herderê bibe, bersiva hertiştî bide. Mirov dê te wilo kêm bikuje wek meytekî. « Sibehê nerîna min wilo winda bû û hinavê min wilo bêjiyan, ko ewana, ên rastî wan hatim, *belkî ez nedîtim*. Li bajaran gemmarê ji min re sor û reş xuyakir, wek mirêkekê, dema di oda li rex çirake biçe û bêt, wek tiştekî buhabilind di daristanê de ! Pirr bextiyarî, min bangkir, û min deryak dît ji agirkeziyan û dûmanê li ezman ; û, li çepê, li rastê, dewlemendî tev gurrdişewitin wek miliyardên brûskan û tavan. Lê kûvîşahî û dilsozdariya pîrekan nebûn para min. Ne carekê hevalkek. Min xwe li pêş cemawerekî bahozane dît, beramberî fermandariya bicihanîna kuştinê, li ser bedbextiyê giriyayî, ya wan nikarîbû fêmkiribana, û li wan buhirî ! – Wek Jeanne d'Arc !- » Keşşeno, profêsorino, advokatino, hûn şaş in, ko hûn min dikişînin ba dadgehê . Ticarî ez ne ji vî gellê han bûm ; ticarî ne filleh bûm ; ez ji wê nijandê me, ya di bin lêxistinê de stra ; ez qanûnan fêmnakim ; ti wate li cem min ji exlaqan re nîne, ez yekî berberî me : hûn şaş in… « Erê, çavên min ji ruhniya we re girtî ne. Ez lawirek im, ez reşik im. Lê dikarim bêm xelaskirin. Hûn reşine sexte ne, hûn, ey serhişkino, xwîntînino, girtîqirikino. Bazirgan, tu

reşik î, dadkar, tu reşik î, fermandar, tu reşik î ; qiral, gurrî, tu reşik î: te ji yê bidizî hatiye kelandin vexwariye, ji metbexa Şeytan.- Ev gel ji tayê û nexweşiya seretanê ilham û inspîrasiyonê werdigire . Şeht û kal ewqasî cihê qedir û qîmet in, da mirov wan divê bikelîne. – jîrbûna herî bilind ew e, ko mirov ji vê kontînêtê barbike, cihê ko dînitî lê dire û têt, da van kirêtan bi êsîran xwedîbike. Ez derbasî şahwelatê rast ê zarokên Ham dibim. Nasdikim ez hîn xwezayê? Nasdikim xwe? – *ne ti gotin zêdetir*. Ez miriyan di zikê xwe de vedişêrim. Qîrandin, def, dîlan, dîlan, dîlan, dîlan! Ez hîn nabînim wê seetê, ya têde ezê, dema yên spî dê ji keştiyan dakevin, xwe bavêjime nemayiyê. Birçîtî, tîbûn, qîrandin, dîlan, dîlan, dîlan, dîlan!

Yên spî digihêjin. Top! Mirov divêt xwe têxe bin destê şûştina pîroz, cilan lixwebike, karbike. Derba têbuhirînê li dilê min da. Ah! Jê re ez ne hazir bûm! Min şerkarî nekiriye. Dê roj ji min re sivik bin, dê poşmanbûn nebe nesîbê min. Minê xwe li ber janan negirtiba, janên giyanê nêzîk jiber başiya xwe têkdiçe, tev ko ronahî tarî bijordikeve wek mûmên miriyan. Bextê lawikê ji malbatekê baş, tabûteke zû bi hêsirên vekirî nixumandî. Çesipandî serserîtî bêaqilî ye, serxweşkarî bêaqilî ye; mirov divêt gennîbûnê bavêje. Wilodûr herê dê neçe, ko seet tenê seeta êşa zalal lêbide! Dê ez êdî bême xapandin wek zarokekî, da li buhiştê bilîzim, di jibîrkirina nexweşiyan tevan de!

Bilez! Hene jiyanine din?- negengaz e, di dewlemendiyê de razan. Zengînî timî ya gişan bû. Evîna xwedane bitenê kilîta zanistiyê diyarîdike. Ez dibînim, ko xurist ne tiştekî dî ye jidervî şanoya başiyê. Bixatirê we, hûn derewwêne,

hûn ideal û mînak, hûn şaştî. Strana melayket ya bihiş bilinddibe ji keştiya rizgarker: ev e hezkirina xwedane. – evîna dutaq! Dikarim bi evîna erdane bimirim, bi xwexelatkirinê bimirim. Min giyanine li pişt xwe hiştine, êşa wan dê xwe pirrbike bi dûrçûna min! Hûn min dibijêrin ji nav keştîşkestiyan; ew, ên lipaşdimînin: ne ew jî hevalên min in?
Wan rizgarbikin!
Hişmendî ji min re çêbû. Cîhan baş e. Ezê jiyanê pîrozbikim. Ezê ji birayên xwe hezbikim. Ev ne bêtir sozine zarokane ne. Jixwewilokêm ne hêvî ne, da ji pîrbûnê û mirinê bifilitim, û ez Xwedê dipesinînim.

Acizî nema di evîna min de peydadibe. Bêhntengî, fasiqî, dînitî, yên ez biserketin û bibinketinên wan gişan dinasim – giraniya min giş hatiye danîn. Em bipîvin bêserxweşî berfirehiya bêgunehiya min. Dê ez nema bikaribim hêviya şadiliya pevçûnekê bikim. Ez xwe bawernakim di dawetekê de hatibim têkelkirin, bi Jesus Christus wek xezorekî. Ez ne girtiyê hişmendiya xwe me. Min gotiye: Xwedê. Ez dixwazim azadiyê di rihetiyê de: çawa wê bidestbixim? Dilbijîna bêexlaqî tevî dev ji min berda. Ne poşmanî pêwîstdike pirrtir, ne hezkirina xwedane. Ez bi ser sedsala dilên hesttenik de nagirîm. Heryek hişmendiya wî heye, guhlênekarî û rehmdilî: ez cihê xwe zeftdikim li ser bûka herî bilind ya vê nêrdewana melayketan ya hişê mirovan yê durist. Bextiyariya jiyana misoger, ya malbatî an na…na, ez wê nikarim. Ez pirr gêjomêjo me, pirr qels. Jiyan bi kar kulîlkvedide, rastiyeke kevn: jiyana min ne têr giran e, ew difirre û li ser kirinê libadibe, ev milê cîhanê. Êdî ez dê bibim çi keçikeke pîr, jilewre mêranî li cem min nîne, ji mirinê hezbikim ! ko Xwedê hedaniya ezmane ji min re ew

bikira nesîb, basivik, limêj – wek pîrozên kevnar.- Pîroz ! evên xurt ! reben, hunermend, çawa mirov nema pêwîstî wan e ! Pêkenînşanoyeke bêdawî ! Bêgunehiya min kare min bihêle bigirîm. Jiyan şanoyeke pêkenînê ye, ya tev têde divê bilîzin.

Bes e! Aniha êşandin.- *pêşve!*
Ah! Pişik dişewitin, cênîk lêdidin! Şev digindire çavên min, tev vê rokê! Dil… endamên laş…
Bi ku de ? Bi tekoşînê ve ? Ez qels im ! Ên din bipêşvediçin . Halet, sileh... dem !...
Agir! Agir bera min din! Li vir! An xwe teslîmdikim.- Tirsonekino! – Ez xwe dikujim! Xwe davêjim ber nalên hespan!
Ah!...
- Dê hînî vî tiştî bibim.
Wê ev ba îcar jiyana ferensî, rêça namûsê!

## ŞEVA DOJEHÊ

Min pareke pirrbaş ji jehrê daqurtand. – sêcaran bera pîroz be şîret, a gihişte min!- Ez hinavên min dişewitin. Hêl û hêza avdoşa şerxwaz laşendamên min lihevdigerîne, min jiawedixe, min davêje erdê. Ez ji tîna dimirim, ez difetisim, ez nikarim qarwarbikim. Ev dojeh e, êşa timheyî! Temaşebikin, çawa agir hildijî! Dê min nikarîba çêtir bişewitim. Hîn, Iblîs!
Min bilez lêvegerandina bi başî û bextiyariyê ve dît, rihetî. Dikarim ez salixdana xuyakirinê bidim, bayê dojehê ji sirûdan re ne bêhnfireh e! li vir miliyonên rihberên bedew hebûn, konsêrtekî melayketan, hêz û aştî, dilçûnên payebilind û pirrtir tiştên dî?
Dilbijandinên payebilind!
Û ev tim hîn jiyan e!- Dema nalet êdî herheyî be! Mirovek, yê dixwaze xwe şehtbike, ew îcar naletlêhatî ye, an na? Ez xwe bawerdikim di dojehê de, de îcar ez wilo me. Wilo li gor catéchisme* ye. Ez koleyê şûştina pîroz im. Dêûbav, we bextreşî bi ser min de anî û pêre bextreşiya xwe jî. Bêgunehê belengaz! Ev e jiyan e hîn tim! Piştre kêfên nifirlêhatinê hîn wê kûrtir bin. Kuştinek, zû! Ko bi navê qanûna mirovan di tinnebûnê de werbim.
Bêdengbe, wilo de bêdengbe! ... ev xizanî ye, gunehdarî, were: Şeytan, yê dibîne, agir şerm e, hêrsa min bêpîvan gêj e. Bes e! ... şaştî ne, ji min re tên pistpisandin, hunerên sihirbaziyê, xweşbêhnên derew, zingînine zarokane. – Û ger mirov têbirame, ko rastî di destên min de ye, ko ez rastdadiyê dibînim: biryarstendineke min ya

diristcan û xurt heye, ez amade me bo tekûziyê û kemalê... payebûnê. – Çermê serê min têtehev. Hewar! Xwedê, ez ditirsim. Ez tî me, wilo tî! Ax! Zaroktî, gîha, baran, bi ser kevirên derya de, *şewqa heyvê, dema diwazde lêdiket ji bircê...* di vê seetê de Iblîs di bircê de ye. Maria! Keçika pîroz! ... – Ez navqetandîdibim ji bêhişiya xwe.
Li wir: ew ne giyanine rast in, ên xêra min dixwazin... bivirde.. balîfeke li ser devê min e, dengê min nare wan, sîber in. Û taliyê hayê ti mirovî ji yê dî nîne. Tikes neyê nêzîkî min! Bêhna biraştinê ji min dertê, ev bêguman e.
Xurifandin bêhejmar in. Tim ez pê êşiyam: ne pirrtir bawerî bi dîrokê, jibîrkirina prinsîpan. Ezê wê nebêjim: helbestvan û pêşdîtvan dê bidexisin. Hezarcarî ez yê herî dewlemend im, bera em destgirtî bin wek derya.
Oh, hîn ev jî! Wilo aniha seeta jiyanê sekinî. Ez nema li cîhanê me.- Olzanistî êdî divê ciddî lê bête nerîn, dojeh bêguman *li binî ye* û ezman li jor. – serxweşî, kabûs, xewa di hêlîna guliyên agir de. Wilopirr rîpbazî di xurustnîgariyê de... Şeytan, Ferdinand, bazbidin bi navkên kuvî ve ... Îsa dimeşe di ser striyê sortarî re, bê wî bijêrde xwarbike.. Îsa di ser ava hêrs re dimeşe. Çira me wî şpya tînepêş, spî û bi guliyine qehwerengî, li kêleka wî pêleke keskî zumurrdî ...
Ezê razan gişan vekim: razên baweriyê û yên xurustê, mirinê, jidayikbûnê, pêşerojê û çûdemê, dîroka çêbûna gerdûnê, tinnebûnê. Hostê fantaziyê me.
Guhdarîbikin! ...
Talênt tev yên min in!- li vir tikes tinne û biserde kesek li vir e: naxwazim zêrbuhayên xwe bifiroşim. – Hûn stranên reşan dixwazin, govenda periyan? Hûn dixwazin, ko windabibim, ko jêravbibim, bo li hingulîskê bigerim? Hûn dixwazin? Ezê zêr çêbikim, dermanan. De bi min

bawerbikin, bawerî alîkariyê tîne, birêvedibe, dirust û rihetdike. Giş, werin- û zarokên biçûk jî-, ko dilê we şabikim, ko mirov dilê xwe bi ser we de birijîne- dilê bêmînak!- Mirovên jar, karker! Ez limêjan ji we naxwazim; bi baweriya we tenê dê bextiyar bim. – Û ko em di min de jî biramin. Ev tev dihêle ez tenê piçekî bi ser cîhanê de xemgînbibim. Ez bextewar im, ne hîn xerbatir biêşim. Jiyana min tenê ji bêhişiyine şêrîn pêkhat, ev mixabin e. Ax çi! De em rûtirşiyan gişan jêbikin. Birastî, em jidervî cîhanê ne. Ne ti deng pirrtir. Pîvana min winda ye. Ax! Asêgeha min, Sakswelatê min, benavdarên min. Êvar, sibeh, şev û rojên min.. westiyayî me ez! Divabû dojeha min a taybet hebe bo hêrsê, dojeha min bo pozbilindiyê- û dojeha şellafkirinê; konsêrtekî sax ji dojehan. Ez jiber westê û bêhêziyê dimirim. Ev tirb e, ez dirim ba kurman, tirsdartir ji tirsan tevan! Şeytan, sêrkvanê şêt, bi sihirbaziyên xwe dixwazî min tinnebikî! Ez xwe davêjim bextê te. Xwe davêjim bextê te! Derbeke bi melhêba tevdanê, dilopeke agir. Ax! Vegera bo jiyanê! Çav li xerabgewdeyê me binerin. Û ev jehr, ev maça hezarcar naletlêhatî! Qelsiya min, çavsoriya cîhanê! Xwedayê min, dilovanî, min veşêre, halê min xerab e!- Veşartî me û ne veşartî me. Ev agir e, yê bi lanetlêhatiyên xwe gurrdibe.

## Tewişandinine 1

Keçika aqilsivik

Mêrê dojehane

Em li mikurhatina dosteke dojehê guhdarîbikin:
„ O mêrê xewdane, axayê min, ne lidij mikurhatina berdesta xwe ya herî xemgîn be. Ez serxweş im. Ez qirrêj im. Çi jiyan e!
Bibuhire, Xwedayê mezin, bibuhire! Ax!Bibuhire!Wilqas hêsir! Û hîn wilqas hêsir piştre, hêvîdikim! Dûra dê ez wî nasbikim, mêrê xewdane! Ji çêbûnê ve hîn ez koleya wî me.- divêt yê dî aniha tenê li min bixe ! Pêşî ez di binê cîhanê de me! O dostên min!... na, ne hevalên min...ticarî berê ne ev tewşmewişandin û jan... Ev êdî zelal e! Oh! Ez dijanim, ez diqarim. Ez diêşim birastî. Biserde ji min re hertişt azad e, barkirî û tije bi guhnedan û kêmlênerînê ji aliyê dilên sar û paye. Îcar wilo, bihêlin ji we re vebêjim, û heger, ko bîstcaran jî divêt dûbarebikim- herwilo şevreş, herwilo bêsûd! Ez dîla mêrê dojehane me, yê keçikên ehmeq avêtine mirin û têkçûnê. Erê ew bixwe ye, ev Iblîs, ne cinn, ne pîrebok. Lê min, ya min hikmet windakiriye û nifirlêhatî me û mirî me ji cîhanê re – min wê tikes nekuje!
- Çawa divêt ez ji we re li ser biaxivim! Ez dikarim erê ne zêdetir bipeyivim. Ez di xemgîniyê de me, ez digirîm,

ez ditirsim. Hineke hênkahî, Xewdê, heger bibe, heger tu bihêlî!
Ez bî me... – ez bî bûm...- lê erê! Carekê ez pirr jêhatî û jixwerazî bûm, û ez çêbûme, neko bihilim û bimînim hestî!... –Ew- ew hema zarokek bû... baljêheyînên wî yên razane ez revandim. Min erkên mirovane tev jibîrkirin, da bidim dû wî . Çi jiyan! Jiyana birra nelivir e. Em ne li dinyayê ne. Cihê ew dirêyê, dirêmê ez jî, divê wilo be. Û pirrcaran dikeve bêhntengiyê de lidij min, *lidij min canê hejar*. Iblîs! – Iblîseke ew, hûn zanin, ew ne insan e. Ew dibêje: „ ez hez ji pîrekan nakim. Hezkirin, mirov dizane, divêt nû bête daçêkirin. Ew dikarin erê netiştekî zêdetir bixwazin ji lêmiqatebûneke bêgumandarî pêve. Ko pêşî bidestket, dê dil û spehîbûn li aliyekî bêne avêtin: tiştê dimîne, guhlênedaneke sar, nanê zewacê, îroroj. An ez pîrekan di nîşana bextiyariyê de dibînim, ji wan yên min dixwest dostine baş çêbikim, ên zû ew hatin daqurtandin ji aliyê Berberan ve, nazik wek koma êzingên vêketî...“ ez lê guhdarîdikim, çawa şermiyê diguhere payeyiyê, tirsdariyê dike balkêşî. „ Ez ji nijadekê dûr im, bapîrên min skendinavî bûn: wan xwe dinav parsiwan de kêrdikir û xwîna xwe vedixwarin.- Li ser laşê xwe gişî ezê birînan bikolim, şanan bineqişînim, wilo nexewşik dixwazim bibim wek mongolekî: tu yê bibînî, ezê di cadan de qîrwîrêbikim. Pirr dînbibim dixwazim ez ji bêhntengiyê. Pêş min neke yekcar xemlê, ezê xwe bixijiqînim û li ser cilikê xwe li xwe bigerînim. Dewlemendiya xwe, wê hêvîdikim baş bi xwînê pînekirî. Ticarî ezê nexebitim...“ Di şevên wilo de , wexta Iblîsê wî ez digirtim, me xwe di erdê de dida, min pê re tekoşîndikir! – Pirr, di şevan de, dema ew mest e, radiweste li ser rêyan an di xaniyan de, bo min ta mirinê veciniqîne û navqetandîbike. – „ Dê çesipandî serê min

bête jêkirin; dê pirr gennî be hîn.“ Oh! Ev rojên ha, dema dihat û diçû, kuştin di awiran de. Carinan dipeyive ew bi awayekî mîna lalan hestdarîtije li ser mirinê , ya dajo poşmaniyê, li ser bedbextan, ên bêşik hene, li ser xebatên zehmet, li ser xatirxwestinên dilan diçirrînin. Di meyxaneyên xerab de, ên di wan de me xwe serxweşdikir, digiriya, dema wî ew didîtin, ên li dor me, heywanên perîşaniyê. Wî serxweşên li ser cadên reş radikirin. Ew wilo dilbirehim bû wek dêyeke şerhez bi zarokên biçûk re. – Ew diçû, bedew wek keçikekê dire dibistana yekşemê. – Xwe zaneyê hertiştî didît, bazirganî, huner, dermanvanî. – Min da dû, diva wilo ba! Min hertişt didît, yê wî di ramanan de, li dora xwe dicivand; cil, beşkîr, textên malê: min sileh bi deyn danê, rûyekî din. Min hertişt didît, yê jê hezdikir, wilo, mîna ew wê çawa wî bixwaze pêkbîne. Dema ew ji min re giyangiran xuyadikir, wilo ez bûm, ya min di kirinine şaşomaşo û seyr de dida dû wî, dûr, di ên baş wekçawa di ên pîs de jî: Ez baş bawer bûm, ezê ticarî derbasî jiyana wî nebim. Çiqeys demjimêrên şevan min li ba laşê wî ê şêrîn ê razayî şiyarîkir, da têderxim, çima ew wilo pirr ji rastiyê dixwest bireve. Hîn ti mirovî ticarî ev dilxwazî nînbû. Min naskir – bêko jê re bitirsim -, ko ew dibe tirsdariyeke rast be di civakê de. – Belkî di destan de veşartî û razên wî hebin, *jiyanê biguherîne*?  Na, ew tenê li wan digere, min li xwe vegerand.  Bi her rewş hezkirina wî ya ji mirovan re pîrebokane ye, û ez girtiya wê me. Ti giyanê dî dê têra wî hêz tinebaya – hêza bêgaviyê û bêçaremayinê!- wê tehmûlbike û ji aliyê wî ve bête parastin û hezkirin. Jixwe min ew bi giyanekî dîtir û cuda netanî ber çavên xwe: mirov firişteyê xwe bi xwe dibîne, ticarî ne yê kesekî din – bawerdikim. Ez di giyanê wî de wek di qesrekê de bûm, ya mirov ew dayehev û

devjêberdaye, bo kesayetiyeke mîna ya me wilo ne pirr payebilind nebîne: ev wilo ye. Ax mixabin! Ez tekûz biyawîker bûm. Lê ewî çi dixwest ji jiyana min a bêreng û xewar? Heger wî mirin bi serê min de neanîbe, wilo wî ez baştirnekirime! Ji xapandinê rûtarîbûyî min jê re gote carcaran: „ Ez te fêmdikim.“ Wî piyên xwe dihejand. Jiber êşa min bê rawest xwe nûdikir û min xwe hîn pirrtir şaşmayî didît li pêşberî çavên xwe – çawa li pêşberî çavan tevan, ên ko dê ziq li min bineriyana, heger bi jibîrkirinekê timdemî û fireh nehatama biriyarlêkirin!- wilo hîn û hîn birçiya başiya wî dibûm. Bi maçîkirin û hemêzkirinên wî re ezmanek bû, ezmaneke tarî, yê derbasbûmê û têde min ji xwe re hêvîdikir di hindirê wî de bême hiştin, feqîr, ker, lal, kwîr. Bûbû ji min re tiştekî adetî. Min em di buhişta xemgîniyê de didîtin. Em di lihevhatiyekê de dijiyan. Bi dilekî germ me karine bihevre pêktanîn. Lê piştî nermahiyekê kûr wî digote: „ çiqa seyr û xerîb belkî ji te re xuybike, ev hertişt, yê tu jiyayî, dema ezê nema li vir bim. Dema tu nema bi zendên min bihisî di bin qirika xwe de, ne zêdetir dilê min, da têde bêhna xwe derxî, ne hîntir ev devê ha li ser çavên te. Jiber ez rojekê divêt herim, baş dûr. Dawî divê ez alîkariya kesên dî bikim: ev wacibê min e. biserko ne hewqasî xweş û balkêş e... ey canê şêrîn...“ Êdî min xwe didît, piştî dûrçûna wî, wek qurbana şaşlivê, ketî di tariyekê tirsdar û navqetandker de: di mirinê de. Min hişt ew sozbide min, min di zehmetiyê de nehêle. Wî bîstcaran ew da min, soza evîndarekî. Ew wilo sivik û diserre bû, wek wexta min jê re digot: „ Ez te fêmdikim.“ Oh! Min li ser wî ti dexsî û xîret nedikişand. Ew dê terka min neke, bawer im. Wê çi bi me bêt? Ew hînî tişkî nebûye, ewê ticarî karneke . Ew dixwaze wek gerrokekî şevê bijî. Başiya wî û nermdiliya wî tenê: dikarin ew

mafekî wî di cîhana birra de biçespînin? Hineke kêlîkan ez jan û êşê jibîrdikim, ya tê werbûme: ewê min xurtbike, emê bigerin, emê nêçîrê di sehrayê de bikin, emê li ser çementa kolanên bajarên nenas razên. Bê xem, bê êş. An ezê şiyarbibim, û qanûn û adet wê bûbin hineke dî – bixêra qeweta wî a magiyane -, cîhan, jiber ew wek xwe dimîne , dê min ji dilxwaziyên min re bihêle, ji kêfên min re û bêxemkariya min. Oh! Jiyana mêraniya tiştên nû, wekçawa di pirtûkên zarokan de, tu yê wê mîna mafekî bide min, min hewqas êş kişandine? Ew nikare. Ez ti tiştî li ser ideal û nimûneyên wî nasnakim. Ew ji min re li ser poşmaniyê axivî, li ser hêviyan: ev divêt îşê wê ji min nînbe. Ew bi Xwedê re dipeyive? Belkî divê ez xwe bavêjime Xwedê. Ez di kûraniya herî binî a koncalê de me û nikarim pirrtir limêjkim.

Dema wî ji min re azar û xemên xwe ravedikir, ma min dikarîbû wa çêtir fêmbikim ji henekpêkirinên wî? Ew êrîşî min dike, min fedîkar derdixe katjimêrandirêj bi hertiştê ji min re li dinyayê hezkirî ye, û dienire, dema ez digirîm.

„ - Ji xwe re li vî xortê spehî binere derbasî vê mala xweşik dibe: navê wî Duval e, Dufour e, Armand, Maurice, bi çi navî be bera bibe. Pîrekekê ji vî çavsorê ehmeq re evîna xwe kiriye qurban: ew mirî ye û bêguman ew ûcaxa ezman e aniha. Çawa ewî ev pîrek bi mirinê de ajot, dê tu jî mirina min bînî. Wilo ye bextê me, ev para me dilên evîndar e...“ Ax! Rojine hebûn, di wan de mirovên xebatkar tev jê re mîna lîstikek tewşmewişandinine ecêb xuyadikirin: Ew kirêt dikeniye, dirêj. – Paşê dîsa dibû wek dayikekê ciwan, wek xuhekê şêrîn. Heger kêmtir ew kûvî ba, emê xelas bûbana! Lê nermdiliya wî jî mirinker e. Ez bindesta wî me. Ax! Ez şêt û dîn im. Rojekê ji rojan belkî ewê bi rengekî seyr

windabibe; lê divê ez wî tiştî bizanibim, dema ew bifire ezman, jibo ko ji xwe re li rêwîtiya hevalê xwe ê biçûk bi ber ezman ve piçekî temaşbikim!
Çi mêrkirineke xerîb!

## TEWIŞANDININE –2-

### Elşîmiya gotinê

Îcar bi ber min de. Çîroka yek ji dînitiyên min.
Ji zû ve min xwe pesinda, her texlîtên dîmenên erdê di bin destên min de ne , û min pêkenok dîtin navûdengên wênekêşî û helbestvaniya nûjen.
Min ji wênekêşiya sade hezkir, dîkorên rengîn li ser deriyan, wêneyên şanoyan, wêneyên bazara salane ên fen û dekbazan, nîşanên firoşgehan, resmên rengçirisî ên gelêrî; wêjeya tozgirtî, latîniya kenîsan û dêran, pirtûkên îrotîkî, ên hayê wan ji rastnivîsê nînbû, romanên pîrikên me, çîrçîrok, pirtûkên biçûk ên zaroktiyê, opêrên kevin, qafiyeyên dûbarebûyî ên bêgiyan, malikên bêhiş.
Min bi cengên xaçvanan xewn dîtin, rêwîtiyên derdîtinên welatan, ên li ser wan ti agahî nînin, komarine bê dîrok, cengên olî ên fetisî, adetên hilweşiyayî, koçkirinên milletan û kontînêntan: min bi her sihirbaziyê bawerî anî.
Min rengê vokalan(dengdêran) afirand!- A reş, E spî, I sor, O şîn, U kesk.- min awe û liva her konsonantî(dengdarî) çesipand, û bi alîkariya malikine sivik û jixweyî min bi xwe da bawerkirin bişelafî, ko min

zimaneke poetîkî çêkiriye, ê dê zû an dereng ji her hisan re liberdest be. Werger min wê çaxê ji xwe re hilanî. Piştire ev tenê ceribandin bû. Min yê nayêtgotin nivîsand, şev, min yê bilêvnabe notîtskir.
Min serxeşî û mestî xurt girt.

Bi dûr ji keriyan, bêrîvanan, cadên balindan,
Çi vexwar min, li ser çogan li wir di nav kulîlkgihayê mêrgan de,
Dorpêçkirî bi bindeqşaxikên birincê nazik,
Di mija paşnîvrojekê de, kesk û germeke nerim?

Çi min dikarîbû ji çemê Oise yê ciwan vexwim,
- Dirrdar hedinî, gîhayekî hişkbûyî, gewriya ezman!-
Ji şûşên kundiran vexwin li vir, dûr ji banê devjêberdayî ê dilsoz? Badeyekê zêrîn, ya xwêdanê dibe.

Min wek nîşana meyxaneyê ji yê berdest re hetîketî anî.
- Berî êvarî bahozekê quba ezman veşart.
Şilahiya daristanan herikî qûmeke paqij,
Bayên Xwedê zîpîk anîn xwarê di golên gennî de;

Di girî de min zêr dît- û nikarîbû vexwim.-

Di seeta çaran de a roja havînî
Dikare evîn hîn razayî bimîne
Di bin daran re difirin
Dûmanên şîvê .

Lê li aliyê dî li ser avakiringehê
Xwe yê fireh, di ronahiyekê hêsperî de,
Hêdî, xwe dilivînin

Kesên xerrat
Di biyabana xwe de a ji kapeka birrekan,
Ko ew textên payebilind diqeşêrin
Bêxem, ên li ser wan
Bajar dê ezmanekî şaş wênebike.

O bo xatirê van karkeran, ên berdestine
Dilsoz in ji qiralê babîlonî re,
Venus! Dev ji evîndaran berde hebekî,
ên di xwe de pîroz û zengîn in.

Hey qirala şivanan, o bîne
Ji karkeran re badeyekê,
Bo qelsbike hêza wan a bêhedan
Ta nîvrojê serşûştin bandike di derya de.

Bale û kevnariya helbstane beşekî wan yê mezin dinav elşîmiya min a gotinê de hebû.
Bûme hîn dilgirêdayîtir bi xewn û xiyalên herî vekirî re: bi hesanî min mizgefteke li şûna febrîkekê dît, dibistanek, ya têde firişteyan lêdana daholê hîndikirin, hentûr li ser kûçeyên ezman, salonek li binê behrekê; dirinde, raz û sir; sernavê stranlîstikekê li pêş min sûretên veciniqandinê mîna bircan lêdikirin.
Piştre min zelalkirin dek û rîpên xwe ên magîbaziyane bi alîkariya xiyalên gotinan!
Dawî ez bi serobinobûya giyanê xwe mîna lanetekê hisiyam. Ez bêsûd û giran bûm, êrîşkirî ji aliyê tayekê giran ve: ez ji lawiran dexisîm jiber bextebaşiya wan – kurm, ên negunehiya ên neçêbûyî simboldikirin, xiltên kor, xewa keçkaniyê!

Gewherê min tehlbû. Min ji dinyayê re got oxir be bi awayine romansane:

*Stranek ji birca herî bilind*

Bi vir ve, bi vir ve,
were, dema evînê, çêbibe.
Wilo pirr min hilgirt,
Ez jê xelasbûm.
Êş û  tirs

Bi azmanan ve neman.
Û tîbûna lawazker
Xwîna min tarîdike.

Bi vir ve, bi vir ve,
Were, dema evînê, çêbibe.

Mîna deştên prêrî
Wilo hatîjibîrkirin jî,
Mezinbûyî, di nav wan de kulîlkdayî
Xerabgîha û bixûr
Bidorbûyî ji mêşên
Bejî ên kirêt.

Bi vir ve, bi vir ve
Were, dema evînê, çêbibe.

Min ji qûmistanê hezkir, baxên fêkiyan ên çûyîxwarê, firoşgehên tozgirtî, vexwarinên bêtehim bûne. Min xwe kişkişand di zikakên bêhngennî de, û bi çavine girtî min xwe sparte rokê, xwedaya agir.

„ General, heger hîn topeke kevin mabe li ser asêgehên te ên herifî, wilo me bombebaranbike bi kêstekên erdê. Ta bi neynikên kirînxaneyên xemilandî! Ta bi salonan! Bihêle bajar toza xwe bixwe. Bihêle avhilavêj zingarbigirin. Tijebike odeyên pîrekan bi şewata mircanên hûrkirî..."

Oh! Kelmêş, ya xwe mestkir ji xanîkê mîzê ê meyxaneyê, ew, dilketiya zimanê sîran e, û ya tîrêjekê zû direşîne!

*Birçîbûn*

Dilbijandina min hebe, îcar tenê
Bo axê û kevir.
Tim ji ba dijîm, dixwim
Tehtan, komer û hesin.

Xwe bizîvirînin, birçîbûnên min, biçêrin
Li ser çêrgeha dengvedayî,
Ji bayên erdan
Vexwin, jehra zelal.

Zixwiran bixwin, yên hatine hêrandin,
Bixwin kevirên kenîsan, ên kevnar;
Tehtên tofanên berê,
Nanên ko di newalên tarî de
Hatine çandin.

Gur qariya li bin pelan
Û pekandin perîkên spehî
Ji xwarina xwe ya mirîşkan:
Wek wî ez ji xwe dixwim.

Li hêvî dimînin tenê, ko mirov wan rake
Fêkî û xes;
Pîrê lê di nav komşaxan de,
Ew tenê wê binefşan bixwe.

Lê heger razam! Bikelim ezê êdî
Li ser qurbanmaseyên Silêman.
Şorbe di ser zingarê re dire
Û tev mezelê Kidron dibe.
Dawî, o başbext, o razîbûn, avête min şînê ezman, ê reş e, û ez jiyam, çirûskeke zêrîn ya ruhniyê *xurist.* Ji kêfê min dest avête derbirînaweyekî, wilo şêt û şaş ta dibe:

Ew dîsa bidestketiye!
Kî? Sermedî.
Ew, derya, bi rokê re
Yekbûyî.

Canê min nemir, sûnda
Te ji te re buha ye
Tev şevê bitenê
Û tije agir yê rojê.

Wisa tu vedirevî
Ji cirîda mirovan,
Ji tevgera dinyayê tevî!
Tu rêya xwe difirî...

Hêvî tinnekirî.
Bê orietur.
Sebr û zanistî
Işkenceyeke çesipandî.

Sibeh çûyî,
Ronahiyeke hevirmêşî,
Şewata we tenê
Divêt hebe.

Ew dîsa bidestketiye!
- kî? – timheyî.
Ew, derya, bi rokê re
Yekbûyî.

Ez bûme opêrake çîrçîrokan: min dît, ko herkes di têkliyekê xerab de ye bi bextewariyê re: kirin ne jiyan e, lêbelê rengeke ji windakirina hêzê ye, jihêlxistina rehan e. Exlaq şûştina mejî ye.
Ji herkesî re, ji min re xuyakir, hîn pirrtir jiyanên din hene. Ev birêzê ha nizane, ew çi dike: ew milyaketek e. Ev malbat cewrik in. Beramberî gellekan ji zilaman ez peyivîm bi dengekî bilind bi bîskekê re ji jiyanên wan ên dî re . – wilo min ji berazekî hezkir.

Hemû dek û rîpên dînitiyê – dînitî, ya mirov wê zindandikin – ji aliyê min ve hatin pêkanîn: min dikarîbû gişan bibêjim, systêm ji min re baş naskirî ye.
Tendiristiya min di bin metirsiyan de bû. Navqetandin bi aliyê min de hat. Ketim bin xewekê pirrroj, û, şiyarbûyî, min xewnên tarî hîn diajotin. Ez stewyayî bûm ji mirinê re, û li ser kolanekê ya xeteran ez kişandime qelsiya min ta dawiya cîhanê û welatê Kîmmeran, cîgehê sîkê û babelîskan.
Divabû herime rêwîtiyê, berdim sihran, yên xwe di hişê min de civandibûn. Li ser derya, ya min pirr jê hezdikir, wekko wê ez dê ji perçeyekî şermê bişûştama, min dît xaça jibîrkirin û alîkariyê derdiket. Bext deyûziya min

bû, poşmaniya min, kurmê min: jiyana min hîn wê bêsînor bimîne, bêtir ko karibe pîroziya hêzê û spehîbûnê be.
Bextewarî! Diranê wê, nerim ji mirinê re, ez bi tirsê agahdarkirim bi azana dîkan re – *ad matutinum,* bi *Christus venit* – di bajarên herî tarî de.

O zemanino ,o kelehino
Ma heye giyanekî rihet?
Min hunera magiyane xwend
Ya bextewariyê, ya herkesî vedirevîne.

Bera silav lê be,
Dema banbike dîkê gallî.

Titişt nîne bo hêvîkirinê. Ax:
Wê ez xistime bin banê xwe.

Can û laş sihirkirin
Û belavkir hemû daxwazî.

O demino, o asêgehino!

Seet, dema ew biçe,
Ax! Wê seeta mirinê be.

O demino, o asêgehino!

Ev qediyaye. Îro dikarim ez silavê li xweşikbûnê bikim.

## YÊ NABIT

Ah! Ev jiyana zaroktiya min, rêya gundan bi her rewşa dinyayê re, vala bi awayekî xerîb, ji parsekê herî baş kêmtir haydarî li ba min hebû, paye bûm, ne welat û ne heval, çi bêhişî bû ev.
- Û aniha bala min tête ser!
- Mafê min bû, van zilamên bajarî guh nedime wan, ên wê derfeta ti destpelandinekê ji xwe nebin, dizên pakî û tendiristiya pîrekên me, îro, çaxa ew wilo hindikî ji me razî ne. Mafê min bû ew guhnedanî tev: jiber aniha direvim!
Ez direvim!
Dixwazim xuyatir xwe derbibirînim.
Doh hîn ez naliyam: „ Ezman! Em têra xwe pirr in, emên nalêtlêhatî li vir li binî! Ez ji aliyê xwe ve jizûve di nav koma wan de me! Ez gişan dinasim. Em xwe timî nasdikin; dilê me jihev dixele. Em nizanin, çi ye rehm û dilovanî. Lê em biedeb in; têkiliyên me bi cîhanê re rast in. „ Ma ev seyr e? Cîhan! Bazirgan, hişsivik!
- Şeref û namûsa me ji me nehatiye dizîn – lê bijartî, ew çawa wê pêşwaziya me bikin? Aniha mirovên zimantûj û qerfçî hene, bijartiyên derew, jiber em gerekî mêraniyê an xwebiçûkdîtinê ne, bo em nêzîkî wan bibin. Ev îcar bijartiyên tenê ko hene. Ên gotinên başiyê belavdikin nînin!
Di dema hîn li cem xwe du qirûşen aqil min dîtin – ev zû diqede -, ji min re zelaldibe, ji ku bela serê min têt: min di dema rast de nedanî pêşiya çavên xwe, ko em li Roava

ne. Gennîgolên roavane! Neko ez ronahiyê pêlîstî dibînim, awe miçiqî, liv şaşçûyî... Baş e! Êdî dixwaze giyanê min bêguman bi tev pêşveçûnên tijetirs barkirî, ên ko raman di wan re derbasbûye ji dema dawiya Rojhilat...Bireve dixwaze ew, giyanê min!
... Herdu qurûşên min ên aqil neman! – Giyan destdar e, ew dixwaze min di Rojava de bizanibe. Bo li gor viyana xwe bixwe biryarbidim, divabû wî bêdengbikim.
Darxurmeyên qurbanan, birqandina hunerê, payebûna nûdîtvanan, taya talankeran, ez van tevan davêjim ji Şeytên re; min berê xwe da Orient dîsa û zanyariya timheyî û kevnar. – xuyaye ev xewn e, ya ji jênehatî û giraniya herî mezin derçû!
Tevwilo, kêm di kêfxweşiya ko xwe ji êşên vê demê vedizim, ramiyam. Di hayê min de paşzaniyariya Qûranê peydanedibû. – lê ma ne lêdaneke birra ye, ko, ji dema vê daxuyaniya zanistiyê, filletî, mirov *henekê xwe bi xwe dike,* xwe yê jixweyî burhandike, xwe dinepixîne bi dilxweşiya, burhanan dûbarebike, û biwilo jiyana xwe derbasdike! Êşek tûj e, zarokane; jêdera serserîtî û windabûna min a giyane ye. Dibe ko xurist acizbibe, belkî! Monsieur Prudhomme bi Xrîstos re çêbûye.
Mane jiber ko em li mijê miqte ne! Bi şînkahiyên xwe ên pirrav em tayê bi serê xwe tînin. Û hînbûna serxweşiyê! Û tûtin! Û nezanî! Û qurbankirin! – Ma ev tev baş dûr in ji ramana rojhilatane, ji zanyariya Orient, welatê kokane? Jiçire ye cîhaneke modêrn, dema jehrine wilo bêne derdîtin!
Mirovên kenîsê wê bibêjin: jixwe wilo ye. Lê tu dixwazî li ser Edenê biaxivî. Titişt ji te re nîne di dîroka gellên orientalî de. – ev rast e; ew Eden e, ya têde ramiyam! Çî wê bi xewna min re heye, ev pakiya cinsên kevnar!

Fîlozof: Cîhan bêtemen e. mirovahî cih diguhere, ev hertişt e. Tu li Rojava yî, lê ji te re azad e, li Orienta xwe bimîne, di kîjan kevnzemanî de be wekhev e – Û li wir baş bijî. Nebe yekî zorçûyî. Fîlozofino birastî hûn ji Rojavayê xwe ne.
Giyanê min, hayê te bera ji te hebe. Xwe bihêz navêje aliyê saxlemiyê. Biceribîne! – Ax ! zanistî pirr hêdî ye ji me re!
- Lê têderdixim, ko giyanê min razaye.
Heger ew ji vê kêlîkê ve tenê şiyar mabaya, emê aniha li ba rastiyê bana, ya ko belkî li dora me ye bi baskên xwe yên giryayî !...
- Heger ew şiyar mabaya ta vê kêlîkê, îcar min dê bi ya karên mirker nekiribaya, ji demekê dûdirêj ve!... – Heger ew tim şiyar mabaya, minê di orteya zanyariyê de babirka xwe biajota!...
O paqijî! Paqijî!
Ev deqa şiyariyê eşkeredîtina paqijiyê diyarî min kir !- Bi riya giyan mirov digihêje Xwedê !
Pîsbextê qetker û çirvan!

## BIRÛSK

Karê mirovan! Ev teqîn, a ko çala min her dem û demekê ruhnîdike.
„ Titişt ne pozbilind e; werin zanistiyê û bipêşve!“ bangdike Ecclesiastê serdem û modêrn, ango *cîhan tev*. Û tevîwilo meytên xêrnexwazan û jênehatiyan bi ser dilê kesên dî de tênexwarê...Ah! zû, lê zû; bi wir ve, li paş şevê, evên dahatî, ev xelatên timheyî... ji me biçin ew? ...
- Ka çi ji destên min têt? Dizanim, bêka kar çi ye; û zanistî pirrgiran pêşve diçe. Ko limêj pipêşve diherike û ronahî ditave..., ez baş dibînim. Ev pirr hesan e, û ew pirr germ e; mirov bê min jî dê bikaribin biserkevin. Ê min wacib û erka min a taybet heye, ezê, wek ên dî, paye bim bi wan, bi riya wan bi aliyekî ve bidehfînim.
Jiyana min pirr bikarhatiye. Îcar hîn! durûyiyêbikin em, tiraliyêbikin em, o çi pîs e! Û emê hebûna xwe bidû xwe de bikişînin, tijexewn bi evînên dirindane û gerdûnên fantastîkî, di wê demê bixwe de, a em têde gazinandikin û xeberan ji xuyaniyên cîhanê re didin, rîpbaz, parsek, hunermend, bendît – keşşe! Bi ser livînên min de li xestexanê bêhna bixûrê wilo xurt vegeriyaye; çavdêrên xweşbêhnên mûqeddes, bawermendino, şehîdino...
Wilo dinasim ez, çawa xirab ez hatime xwedîkirin bi zaroktî. Hîn çi!... Hîn bîst salên xwe biqedînim, wilo baş, wekko ên dî bîst salên xwe diqedînin...
Na! Na! Aniha ez lidijî mirinê berxwedanêdikim! Kar ji payebûna min re pirr hesan û sivik xuyanîdike: xinizî û xiyaneta min bi cîhanê re dê êdî lêdaneke kurt be. Di kêlîka dawî de, ko li aliyê rastê, li aliyê çepê bidim...
Îcar – oh! – hey giyanê belengaz, ko timheyî û sermediyyet bo me ne winda ba!?

## SIBEH

Mane carekê xortanîdemeke min a hêjayî hezkirinê hebû, lehengane, çîrokane, li ser pellên zêrînî dihate nivîsandin-Gellekpirr bextewarî! Bi riya kîjan qebhetkirinê, bi riya kîjan şaşiyê ev bêkêrhatina aniha bi serê min hat? Hûn, ên dibêjin, ko lawir axînên êşê diqarînin, ko nexweş bêçare û têkdiçin, mirî pîs xewnandibînin, bikin hûn ketina min û xewa min çîrokbibêjin. Ez bixwe dikarim xwe wilopiçekî şîrovebikim wek yê parsek bi *Pater noster* û *Ave Maria* ên wan bêrawest dûbaredike.
*Nema dikarim biaxivim!*
Biserde, îro bawerdikim min dojeha xwe ta dawî vegot. Birastî bû dojeh; ewa kevin, ya dergehên wê ji aliyê lawê mirovan hate vekirin.
Ji wê qûmistana timbixwe, di wê şeva timbixwe de, şiyardibin çavên min ên westiyayî bi ser zîvstêrê de, bê ko qiralên jiyanê, hersî magîbaz û sihirbaz, bêne livandin, dil, giyan, rih. Kengî emê, di ser peravan û çiyayan re, çêbûna karê nû silavbikin, zanyariya nû, bazdana zordaran û pîrebokan û cinnan, dawiya xurafatan û pîrozbikin – wek ên pêşî!
- Cejna Christmasê li ser erdê!
Strana ezmanan, rêza gellan! Koleno, de bera em lanetê li jiyanê neynin.

## Oxir

Bûye bayîz! – lê çima bi dû rokekê timheyî de xemgînbibin, dema me dabe rê da ronahiyekê xwedane em bibînin – dûrî mirovan, ên dimirin bi demsalan re.
Payîz. Keştiya me, bijorketî di mijekê tevizî de, dizîvire bendera perîşaniyê, bajarê qerrase bi ezmanê nepaqij ji qirrêjê û agir. Ah! Paçikên gennî, nanê bi baranê şil, serxweşî, hezar evîn, yên ez xaçkirim! Êdî ma wê neyêt dawiya vê pîrekqirala xwînmij li ser melyonan ji giyanan û jinên mirî, *ên bi ser wan de hîn dê dadbirî bêt!* Ez hîn xwe dibînim, çerim peritî ji lewitandinê û pêstê(ta`ûnê), por û binçeng tije kurim û kurmine hîn mezintir di dil de; xwe dibînim vezilandî dinav nenasine bêtemen û hest de... dibû li wê derê miribama...xiyaleke tirsdar! Dilê min ji perîşaniyê dixele.
Û ji zivistanê ditirsim, jiber ew demsala rihetiyê ye!
- Carinan li ezman dibînim peravine bêdawî nixumandî bi geline spî yî kêfçî. Di ser min re, di bayên sibehê de, dilerizîne keştiyek zêrîn î mezin alên xwe yên rengîn. Min dawet û şahî tev afirandin, kêfên biserketinê tev, dram tev. Min hewilda, kulîlkine nû, stêrine nû, goştekî û xwînekê nû, zimanine nû çêbikim. Min bawerkir xurtînine serxuristî dê bidestbixim. De baş e! ez divêt talêntê xwe yê afirandinê û bîranînên xwe binaxbikim! Navûdengê hunermendekî û çîrokbêjekî- bera biçin!
Ez! Ez, yê navê sihirbaz û periyekî lixwekir, ji her exlaqan şûştî, ez li erdê hatime vegerandin, li erkekî bigerim û birrahiya hişk hemêzbikim! Cotkar!
Ma hatime xapandin? Dilovanî, divêt ew îcar xuha mirinê be ji min re?

Wek hertim, da min xwe bi derewê bixwarindikir, divêm lêmegirtinê bixwazim. Û hîna! Lê ne destê hevalekî! Û ji ku alîkariyê derînim?

Erê, seeta nû bikêmanî pirr ciddî ye.
Jiber ez dikarim bibêjim, biserkeftina min bêguman e: ev Teqteqa diranan, qurpqurpa agir, nalîna nexweş, tev kêmdikin. Bîranînên dilxelker diçilmisin. Hestderbrînên min ên biêş ên dawî xwe vedidizin – Dexs û hesûdiya lidijî parsekan, dizan, hevalên mirinê, lipaşmayên ji hemû rengan. – lanetlêhatî, ko min heyfa xwe hilaniya!

Mirov divê bêguman serdemî û modêrn be.
Ne zêdetir sirûdên xêrxwaz: pêşçengkirinê windaneke. Şeva dijwar! Xwîna zûha dişwite li ser rûyê min, û titişt li piş min tinne ji vê dara biçûk a kirêt pêve!... Şerê giyan wilobixwe lawirane ye wek cengên mirovan; lê eşkeredîtina dadmendiyê dilxweşiya Xwedê tenê ye.
Aniha îcar dema hişyariyê ye. Hemêzbikin emê hemû lêdanên hêza jiyanê û delaliya rast. Û şiveqê, çekdarkirî bi sebrekê gurrkirî, dê em derbasî bajarên spehî bibin.
Çi li ser destê hevalekî axivîm! Bidestxistinek xweşik e, ko karim bi evînên rîpdar ên kevin bikenim û wan cotên hevalan ên derewîn xizan bibînim – min li wir binî dojeha pîrekan dît; - û wê ji min re misoger be, *rastî a min be di giyanekî û laşekî de.*

April- August, 1873

* pirtûka dersdanên fillehan, bi rêya pirs û bersivan